Zarokên di bin 18 salî de ku daxwaza parastinê (penaberiyê) kirine û li Norwêcê dêûbavên wan tune ne

Agahdarî li ser demên libendêmayinê bi gelek zimanan

UDI niha bi kê re hevpeyvînê dike û bersiva daxwaznameyên wan dide?

UDI dê bi domdarî bi zarokên qasir re ên ku daxwaza parastinê dikin hevpeyvînê bike. Eger doza te ya AMMR be, dibe ku çend meh derbas bibin heta were diyarkirin ka daxwaza te dê li Norwêcê an jî li welatekî din ku te tiliyên xwe lê dane were nirxandin.

Eger piştî hevpeyvînê hewcedariya UDI nebe lêkolînên zêdetir bike, em ê biryarê di zûtirîn demê de bidin.

Ji bo yên ku ji Sûriyeyê ne

UDI dîsa dest bi nirxandina daxwazên penaberiyê yên hemwelatiyên Sûrî û bêwelatiyên ji Sûriyeyê kiriye.

Piştî ku rejîma nû bû desthilatdar, rewşa li Sûriyeyê gelekî guherîye. UDI divê dozan li gorî rewşa nû binirxîne. Ji ber vê yekê dê nirxandina dozan demeke dirêjtir bixwaze.

Dibe ku tu bibînî ku hin kes berî te bersivê werdigirin, her çende wan piştî te daxwaza penaberiyê kiriye. Hin doz demeke dirêjtir ji yên din dixwazin.

Me bi gelek kesan re hevpeyvîn kirine, lê hîn jî hin kes li benda hevpeyvînê ne. Eger me berî rawestandina nirxandina dozan bi te re hevpeyvîn kiribe, dê tu ji bo hevpeyvîneke nû werî gazîkirin.

Em ê te agahdar bikin dema ku dora te ji bo hevpeyvînê were.

Çima hin kes berî min bersivê werdigirin?

Em pêşîniyê didin wan kesan ku demeke herî dirêj li benda bersivê mane. Lê hin doz ji yên din demeke dirêjtir dixwazin ji bo kirina hevpeyvînê û nirxandinê. Tevî ku divê tu ji yên din zêdetir li bendê bimînî jî, ev nayê wê wateyê ku me doza te jibîr kiriye.

Ev hin sedem in ku dihêlin ku dem dirêj bibe:

Eger em piştî hevpeyvînê hewceyê lêkolînên zêdetir bin di doza te de, ev dikare bibe sedem ku wergirtina bersivê demeke dirêj bixwaze.

Eger UDI bibîne ku doza te divê li welatekî din ê AMMR were nirxandin, ev jî dikare dema li bendêmayinê dirêj bike. Hingî dibe ku tu ji bo hevpeyvînê ji yên din zêdetir li bendê bimînî.

Eger sedemên din hebin ku ji ber wan hîn hevpeyvîn bi te re nehatiye kirin an te hîn bersiv wernegirtiye, em ê parêzerê te agahdar bikin li ser sedema derengiyê.

Em dizanin ku libendemayîn zehmet e, û em ji aliyê xwe ve bê hedan dixebitin da ku hemû daxwazên penaberiyê di zutiriîn wext de werin nirxandin.

Pêwîst nake ku tu bi UDI re têkiliyê daynî da ku bipirsî kengî dê lênêrîna doza te xelas dibe. Em ê bersivê ji te re an jî ji kesê ku te temsîl dike re bişînin.

Gelo tiştek heye ez dikarim bikim ku bihêle ku dema libendêmayinê kurtir bibe?

Tu dikarî hay jê hebî ku belgeyên te yên nasnameyî di zûtirîn demê de bighin me.

- Eger belgeyên te yên nasnameyî yên orîjînal hebin, divê tu wan radestî navenda polîsê herêmî bikî. Tu dikarî ji nûnerê xwe alîkariyê bixwazî ji bo radestkirina belgeyan.
- Eger li cem te kopî û wêneyên belgenameyan hebin, tu dikarî wan bi xwe re bînî hevpeyvînê an jî bi postê (berîd) bişînî vê navnîşanê:

  Utlendingsdirektoratet (UDI)
  Postboks 2098 Vika
  0125 Oslo

Li ser belgeyan hejmara DUF-a xwe binivîse. Nûnerê te dê di vê yekê de alîkariya te bike.

Nûkirina agahiyan

Nûkirina dawî: **Mijdara/novembera 2026**.

Nûkirina di pêş de a tê payîn: **15ê Sibatê 2027**.